*Lokman Polat*

# SERSEBÎL KANIYA CENETÊ

**Helwest Förlag**

Helwest Förlag

ISBN : 978 - 91 - 89224 - 22 - 3

Editor : ..........................

Çap : Peknotryck ofsset

Çapa yekem : 2020 –

Adres / Navnîşan

lokmanpolat-1@hotmail.com
helwestforlag@hotmail.com
lokmanpolat2000@yahoo.se

**Têbinî /** Ev pirtûk cara yekem wek PDF di malpera Bernamegeh de hate weşandin.

## SERSEBÎL
## KANIYA CENETÊ

Ez li esmerek geriyam
Min spîyek dît
Evîndara min
Wisa spîye ku
Weke peleka berfê ye
Min bi destê wê girt
Wê bire ser kanîya Sersebîlê
Em li wir şad û bextiyar bûn
Em bi hevre xweşhal bûn
Em pev şa bûn

Evîndarên ku di vî dinya fanî de
Miradê wan neçe serî
Li wiyalîn, di dinya ebedî de
Li ser kanîya Sersebîlê
Anku kanîya cenetê ye
Miradê wan li wir diçe serî

## HELBEST

Dibêjin pirtûkên helbestan nayên firotin
Xwendevan helbest naxwînin
Rewş wehabe jî
Dê dîsa jî helbestvan
Helbest binivîsin
Pirtûkên helbestan biweşînin

Helbest dermanê ruh e
Bila evîndar
Helbestên evînê bixwînin
Dilê xwe pê germ bikin

## RONAHÎ

Ronahîya cenetê
Wek hîkmeta rojê ye
Bi qûdret û ezamet e

Ronahîya evîna dil
Wek ronahîya rojê ye
Pîrozîya jîyanê ye
Muqaddesa hestê ruhî ye

# JÎYAN HÊSAN NÎNE

Jîyan hêsan nîne
Lê, jîyan pir xweş e
Û xweş e ku
Mirov li ser yara xwe
Stran bibêje

Di şevên tarî de
Di ronahiya hîvê de
Di kuçe û siqaqan de
Bi yara xwe re gerandin
Hizûr û aramî dide mirov

Belê, jiyan hêsan nîn e
Zehmetiyên jiyanê pir in
Lêbelê ji jiyanê xweştir
Tu tiştek nîn e

Jiyan xweş e
Mirin nexweş e
Lê jiyana bê mirin nabe
Mirin carna paqijîye

Weke jiyanê mirin jî hêsan nîn e
Hêsan nîn e ji vê cîhanê çûyin
Lê koçbarineke mecbûriye
Yên ku bijîn dê bimrin jî

Yên zilimkar, gunehkar, xedar
Dê di agirê cehenemê de bişewitin
Yên baş û qenc, xêrxwaz û mirovhez
Dê di baxçeyê adenê de
Li ser kaniya Sersebîlê gulên cenetê bêhn bikin.

## AMEDA RENGÎN

Ameda rengîn
Tu dilê welatê min
Rengê civaka min
Hebûna welatê min î

Dengbêjên welatê min
Li ser azameta te
Klam û stran dibêjin
Pîroziya te tînin zimên

Ameda rengîn
Şêx Seîdê nemir
Di hemêza te de
Razaye

Navên te û wî
Di dilê gelê kurd de
Cih girtiye
Hûn nayên jibîr kirin

## AX Û AZADÎ

Cihê ku dagirker pên lêkin
Ax hişk dibe

Cihê ku dagirker hikûm bikim
Azadî dîl dibe

Roj dê bê
Gulên azadiyê vebibe
Axa hişk nerm bibe

## AZADIYA GEL

Min sirgûniyê kûşt
Ez azad bûm
Lê, gelê min hêz bindest e,
Ne azad e

A girîng azadiya gel e
Dema ku;
Welatê min rizgar bû
Û gelê min azad bû

Azadiya min û azadiya gel
Dê bi hevre bên rapêçan

## DU MEZIN

Ahmedê Xanî û Mistefa Barzanî
Du mezinên kurdan in
Ahmedê Xanî di edebiyatê de
Mistefa Barzanî di şerê çekdarî û siyasetê de
Bi huner bûn, rênas bûn
Herdu jî ji bo doza netewa kurd sembol in

Ahmedê Xanî û Mistefa Barzanî
Hîmê bingeha edebiyata kurdî û
Siyaseta netewî û têkoşîna gelêrî danîn
Rêbaza herduyan li dij tarîtiyê
Ji bo netewa kurd bû ronahî
Ew di dilê kurdan de herdem dijîn

## GORÎSTANA ŞEHÎDAN

Ey şehîdên pakrewan
Ne ji bo ku
Ez şîna we bigrim
Ji bo ku
Ez li ber gora we
Helbesta şehîdan bixwînim
Têm serlêdana
Gorîstana we

## CIHÊ PÎROZ

Li navça Licê
Gorîstana şehîdan
Ciheke pîroz e
Li wir
Şehîdên çekdar
Mêrxasên bênav
Radizin
Ji wan her yek
Ji herêmeke welêt
Ji bo azadîya gel
Çek hildan
Têkoşîyan
Şehîd ketin
Ew nîşana azadîyê
Sembola rizgarîyê
Mînaka fedekarîyê
Fedaîyên bênav in
Cihê wan ê pîroz
Bi gul û kulîlkan
Bixemilînin
Wan herdem
Bi bîr bînin

## KEÇA WELAT

Min di xewna xwe de dît
Ez vegeriyabûm
Çûbûm welêt
Li wir min keçeka bedew dît
Xwedêyo! Bê çiqas rind bû
Xwîna wê çiqas xweş bû
Ew dîyarîya
Bîst salên sirgûnîyê bû

## TAYA EVÎNÊ

Min qîma xwe
Bi porzer û çavşînan nanî
Ez li pey esmera narîn
Bi hestên evînî geriyam

Min esmereka delal dît
Stêrka zêrîn bû
Kulîlka şêrîn bû
Bû ezîza ber dilê min

Ez bi taya evînê ketim
Ji ber êşa evînê bêheş ketim
Derd û kulên evîna platonîk pir in
Dermanê wê tun in

Dema ez vegerim welatê xwe
Heger ez esmera şêrîn bibînim
Ew ê bibe dermanê
Êşa dilê min

Ez ê xilas bibim
Ji taya evînê
Şad û bextiyar bibim
Bi esmera welatşêrînê

# HEQÊ EVÎNDARBÛNÊ

Heqê min heye
Ez evîndar bim
Kes vî heqî
Nikare ji min bigre

Evîn di dil de zîl dide
Ne ez bi dilê xwe karim
Ne jî tu kesekî din
Tu hêz bi qûdreta evînê nikare

Di beyanên
Mafê mirovan de
Heqê evîndarbûnê
Nehatiye nivîsîn

Di yaasayên dewletan de
Behsa heqê evîndarbûnê
Nehatiye kirin

Însanan li dijê kedxuriyê
Ji bo azadî û demokrasiyê
Serîhildane, têkoşiyane
Divê ji bo evînê jê têbikoşin

Heqê aşiqbûnê
Heqê hemû însanan e
Çi ciwan, çi kalepîr
Herkes dikare aşiq bibe

Aşiqbûnî îcaze naxwaze
Yên ku aşiq dibin
Tucar evîna xwe
Ji bîr nakin

Yên aşiq bê xew dimînin
Diêşin, dizarin
Êşa evînê
Ji dil dikşînin

Hinek dixwazin
Ji kalepîr û zewicandiyan re
Aşiqbûnê qedexe bikin
Evîn qedexeyan nas nake

## ROJA EVÎNDARAN

Roja evîndaran  pîroz be!

Bila roja we ya evîndaran
Bi qasê evîna we pak be

Bi qasê ruhê we zelal be
Bi qasê dilê we narîn be

Bi qasê bêrîyên we bi hêz be
Bi qasê hêvîyên we jîndar be

Evîn hesteke pîroz e
Tu qanûnekî nikare
Pêşî li evînê bigre
Tu kesek nikare, nehêle ku
Însan ji însaneke din hez bike

Xwezî bi wan yên ku dizanin hez bikin.

# BIRÎNA EVÎNÊ

Tu di xewn û xeyalê min de
Wek kulîngê
Daketî deryaya dilê min
Tu di xewna min de
Bûyî dilopek av
Bûyî hêstirê çavan
Tu di xewna min de
Bûyî xencer
Li dilê min ketî

Te di dilê min de
Birînek vekir
Birîneke bi êş
Birîneke bi derman
Evîna te
Dil û kezeba min
Şewitand

Ji hasreta te
Ji dilê min ê şewitî
Dûman derdikeve

Tu bi şev di xewna min de
Tu bi roj di xeyalê min de yî
Sancîya birîna evînê
Dilê min diêşînê

# TU ZANÎ

Ez nizanim ez ê ji bo te çi binivîsim.
Tu zanî ez ê ji bo te çi binivîsim?

Zanibe
Ez ê
Îşev
Ji bo te
Di nav dilê xwe de
Rûpeleke pak vekim

Ez ê hetanî
Dawiya temenê xwe
Ji te hez bikim
Li pey te bigerim

Ez ê bîranînên xwe
Yên ji bo te
Weke kurteromanê
Binivîsim

Ez ê şevên xwe
Bi te re
Parve bikim
Bi xeyalên te derbas bikim

Tu li cem min nebî jî
Dê ruhê te li cem min be
Ruhê te dê bibe
Şirîkê tenêtiya şevên min

Ez ê bi xeyala te
Şad û bextiyar bibim
Bêhna gula mala min
Dê bêhna te bîne bîra min

Ez ê gulê bêhn bikim
Herweke ku te bêhn bikim
Dê wext û demên min
Bi hesreta te bibûre

Tu likur dibî bibe
Tu di dil û ruhê min de yî
Tu ronîya roja min î
Narîn û delala şeva min î

Tu canê min î
Tu sira hest û ruhê min î
Delala ber dilê min î
Evîna jîyana min î

# DIBÊJIN

Dibêjin dema dilê mirov bikeve yekê
Mirov pê re bizewice
Êdî evîna mirov diqede.

Lê, heger dilê mirov bikeve yekê
Mirov pê re nezewice
Ew evîn her didome.

Dibêjin miradê evîndaran naçe serî.
Loma jî evîna evîndarên bêmirad evîna rasteqîn e.

Dilê mirov bikeve yekê
Ew di nav dilê mirov de
Her dijî û tu car ji nav dilê mirov dernakeve.

Gelo, wisan e? Rast e yan na?

Bi min ji sedîsed rast e.

# BÊRÎ

Ez bêriya te dikim
Êşa dilê min tehemûl nake
Ez bêriya te dikim

Bi qasê ku mirî
Bêrîya jîyanê dikin
Bi qasê ku zarok
Bêrîya dê dikin

Ez bêrîya te dikim
Bê te ez xemgîn im
Dilê min dizare
Wekî zarokan digrîm

Ez bêrîya te dikim
Di xewnên min de
Tu heyî

Di hemû peyvên ku
Ez diafirînim de
Tu heyî
Ez bêrîya te dikim

Ez hemû peyvên xweşik
Ji bo te diafirînim
Helbestên xwe yên evînî
Ji bo te dinivîsim

Ez bêrîya te dikim
Hemû demên min
Xewnên min
Ji bo te ne

Ez bêrîya te dikim
Hebûna te
Saxiya min e

Ruhê te
Dermanê min e

Derdê te
Kedera min e

Şahîya te
Bextiyariya min e

Ez bêrîya te dikim
Bêrîkirina te
Bi huzin û keder
Ruhê min radipêçe

Ez wekî ku bebik
Bêrîya memika

Dayika xwe bike
Bêrîya te dikim

Ez ji jîyanê
Ji xeynê
Dîtina te
Tişteke naxwazim

Ez ji Yezdan
Dixwazim ku
Tu jî
Ji min hez bikî

Ez bêrîya te dikim
Bila xewn û xeyalên min
Rastîya evîna min bin
Tu canê min î

Ez bêrîya te dikim.

## DOST

Çar rojên dinê de
Ji xirabiyê çi derdikeve
Başî bikin

Dostên mirov yên baş hebin,
Çi xweş e
Dostên dilsoz, rasteqîn
Jiyana mirov rengîn dikin

Dema mirov bi dostên xwe re diaxife
Bêhna mirov derdikeve
Dilê mirov fereh dibe
Mirov şad û bextewar dibe

## SEBIR

Xwedêyo,
Tu sebra Eyûb Pêxember
Bidî evîndaran

Evîndarekî
Nozdehsal sebir kir
Nikare salek sebir bike

Maye salek
Ku bigîşe evîndara xwe

## MÎRÊ GULA

Yê ji gula hez neke
Ji xwe jî hez nake
Yê ji xwe hez neke
Ji civakê jî hez nake
Yê ji civakê hez neke
Ji welat jî hez nake

Yê ku ji hemûyan hez neke
Nabe cenetî
Ava kanîya sersebîlê venaxwe

Mîrê gula ji hemûyan hez dike
Lewre jî cenetî ye û xwedî xelata ebedî ye

## AZMÛN

Em di azmûna
Evîn û jiyanê de
Derbas dibin
Evînên têkçûyî
Bi derbendên
Sê darê ve
Têne eliqandin

## XEMGÎN NEBE

Welatê min ê şêrîn
Çima tu xemgînî
Xemgîn nebe
Binêr li deşt û çiyan
Gul û kulîlk vekirine
Mîrê gulan jî
Waye hate cem te
Xemgîn nebe
Tu jî dê azad bibî
Binêr, li başurê te
Waye şibakek vebû
Ew dê ronahîya xwe
Bide te

## NEÇAR

Di derûnîya ruhê wê de valahîyek pêk hat
Ew di nav Xelîl û Celîl de bê hêvî ma
Nizanibû çi bike, kîjan helbijêre?

Di alîkî de malbata wê
Di alîkî de dilê wê

Dê li gor malbata xwe bikira
Yan dê li pey dilê xwe biçana?

Ew mabû neçar, nizanibû çi bikirana.

## ÇARE

Tu bêçareyî, neçar î
Çare tuyî
Tu bi xwe yî

Tu we diqehirînî
Tu nebî dê kî te biqehirîne

Tu nexwazî kî dikare
Valahiya hundirê te dagire
Tu amade nebî,
Kî dikare te şah bike

Ji xeynê te
Kesek nikare
Te baxtiyar bike

Tu îcaze nedî
Kî dikare te aciz bike
Tu jê hez nekî
Kî ji te hez dike

Hertişt bi te dest pê dike
Û her tişt bi te diqede

Jîr û jêhatî be
Netirse, bêtirs be

Xwesteka jiyanê
Ji hundirê xwe dernexe

Ti bi bîr bîne
Çare tuyî
Tu bi xwe yî.

## DERD Û KUL

Tiştên ne girîng, girîng nebînin
Tiştan ji xwe re nekin derd
Derd û kul mirov nexweş dixe
Derdê evînê mirov bêheş dike

Derd, kul, qehdr û keder
Mirov nexweş dixe
Nexweşiya penceşêrê
Ji ber qehr û kederan e

Xwe neqehirînin, bi keder nebin
Gelek kes ji ber qehriya jina xwe
Nexweş dikevin, qanser dibin
Û bi ciwaniya xwe dimirin

Tiştan ji xwe re nekin derd
Bizanibin tu tişteke bêqisûr nabe
Rehetbin, bedbîn nebin, xweşbîn bin
Bi evîn bin, ji însanan hez bikin

Ji bîr nekin,
Karê dinê naqede,
Dema hûn bimrin jî
Hêj karê ku we dê bikira heye

Gotina kesê nebirin
Zanibin gohdarî bikin
Başî bikin,
Lê ji kesek re nebêjin

Ji xeynê xwe herkesî
Zana bihesibînin
Bi sebir û aram bin
Ji însanan hez bikin

Ji bo evînê
Destê xwe dirêj bikin
Ji xwe pirsan bikin
Rastiya xwe qebûl bikin

Jiyan ji bo her însanî adîl nîn e
Ji bo jiyaneke adîl hewl bidin
Carna bêhnteg bibin
Xem nexwin

Nas û dostên xwe ji bîr nekin
Carna silav bidine wan
Halê wan bipirsin
Qedrê dostaniyê bizanibin

Jiyan bi êş be jî
Divê ew êş bê kişandin
Jiyan tiştê herî xweş e
Ji bo yê ku bizanibe bijî

Însanan wekî zarok û kalepîran bibînin
Însanan fêm bikin
Gohdariya wan bikin
Xwe têxin şûna wan

Her însan xwedî xuyê cuda ye
Exlaqê hemûya newek hev e
Nebin sedemê xirabiyê
Hertim başî bikin.

## GEL Û WELAT

Li rojhilata navîn
Welatê parçekirî
Gelê zincîrkirî
Welat û gelê min e

Welat û gelê min
Dê û bavê min
Heval û dostên min
Negrîn

Ez ji bo we digrîm

## CENETA CÎHANÊ

Li welatê min
Çiyayên bilind
Zozanên honik
Zîyaretgehên pîroz
Pir û qesrên dîrokî
Darîstanên pezkuvî
Baxçeyên cenetî
Hene.

Li welatê min
Jinên bedew
Keçên xezal
Xortên çeleng
Mêrên mêrxas
Hene.

Li welatê min
Comerdî, mêvanperwerî
Têkiliyên dostanî
Hevaltiyên biratî
Piştgirî û alîkarî
Hene.

Li welatê min
Gelek tişt hene
Lêbelê,
Welatê min
Rizgar nîn e
Gelê min
Azad nîn e
Azadî û demokrasî
Şêweya jiyanê ye
Ew jî li welatê min
Tune.

Heger ew jî hebana
Dê welatê min
Ceneta cîhanê bana.

## MIRWET

Ez bûm Lokman
Nebûm hekîmê
Derd û kulan
Ez bûm evîndar
Min nedît mirweta evînê

## JIYANÊ DIBÎNIM

Dilopên baranê
Wek hêstirên çavên te ne
Di ronahiya ruhê te de
Her roj jiyanê dijîm
Di çavên te yên xweş de
Jiyanê dibînim

## EVÎNDARA TIRSONEK

Wî di destpêka riyeke tarî de çavên te dît.
Dema ku ew ji jiyanê bêzar bû
Ji te hezkirina wî bû hezkirina ji jiyanê jî
Evîna te jiyanê bi wî da hezkirin

Ew ji evînê netirsiya
Lêbelê tu ji evînê tirsiyayî
Ji tirsa evînê tu newêrabû
Evîna dilê xwe eşkere bikî

Lê, te evîna ku tu jê ditirsî
Di nav dilê xwe de berşê da
Ew cesaret bi te re tune
Loma tu newirayî evîna xwe qebûl bikî

Ji ber tirsa evînê
Tu dixwazî xwe ji evîndarê xwe
Dûr bixî

Ew çiqas dûrê te be jî
Ji te dûr nîn e
Bêhna te di poza wî de
Dengê te di gohê wî de ye

Çavên wî ji xeynê te
Tu tişteke din nabîne
Laş û ser û rûyê te
Weke wêneyeke di mejiyê wî de ye

Ew ji evîna xwe û te natirse
Wî bi eşkera evîna xwe
Pêşkêşê te kiriye

Herçiqas tu ji evînê ditirsî jî
Di xewn û xeyalên te de evîn
Dev ji te bernade

Heş û eqilê te
Bi dizî be jî
Li ser evîndarê te ye

Dilê te ji ber evînê
Pêl dide, dibe agir û alawî
Dişewite

Tu ji ber êşa dil bi dizî dizarî
Derûniya hest û ruhê te nebaş dibe
Ji bo aramiya ruhê xwe
Tu xwe bi xwe dixapînî

Hinek bi cesaret be
Li evîndarê xwe neheqî neke
Ji evîna wî re bi rêz û hurmet be
Bizanibe ku herî pir ew ji te hez dike

Tu çiqas dûrê wî bî jî
Hest û ruhê wî nêzî te ye
Tu çiqas bêhêvî bî jî
Ew bi hêvî ye

Tu evîna xwe jê re rave nekî jî
Ew li benda te ye
Ku tu rojeke evîna xwe
Jê re pêşkêş bikî

Were netirse
Eşkere jê re bibêje
Ku tu jî ji wî hez dikî

Lêbelê, nebe nebe
Hûn bi hevre nezewicin
Zewac mirina evînê ye

Evîndarên rasteqîn
Divê negîşin miradê xwe
Ku evîna wan bibe nemir.

## ZEWAC

Kurik ji bavê xwe re dibêje :
”Bavo bihayê zewacê çiqas e?”
Bavê wî dibêje :
”Kurê min, ez nizanim
  Ez hêj jî heqî didim, lê naqede.”

Dema zewacê, di sala pêşîn de
Mêr diaxife, jin gohdarî dike
Di sala duyem de
Jin diaxife, mêr gohdarî dike
Di sala sêyem de
Herdu jî dipeyivin, dikin qirecir
Cîran li wan gohdarî dikin
Dema jin û mêr pev diçin

Jin dibêje : ”ez xêfikbûm ku bi te re zewicîm.”
Mêr bersîv dide, dibêje :
”Ez aşiq bûm, min xêfikiya te ferq nekir.”

## HALEPÇE AZAD E

Halepçeya birîndar
Rehet bû
Halepçeya êsîr (dîl)
Azad bû

## BEXTÎYARÎ

Divê tu şad û bextiyar bibî
Ji bo tu şad û bextiyar bibî
Beriya ku tu yekê helbijêrî
Xwe helbijêre

Ji bo xwe bijî
Ji bo xwe hez bike
Ji bo xwe bibe evîndar

Xwe biecibîne
Gohhdariya hestên xwe bike
Tuyê bibînî formula şadbûniyê

Bifikir, heger tu ji govendê hez dikî
Wisan e, miheqeq govend bigir
Dê laşê te sivik bibe
Ruhê tea ram bibe

Di qarektera hinek însanan de heye
Ew miheqeq paşgotinî dikin
Kî paşgotiniya te bike jî
Goh nede gotinên wan

Heger tu ji rêwîtiyê hez dikî
Rêwîtî bike, here cihên din
Xwarin û vexwarinên ku tu ji wan hez dikî
Bixwe û vexwe

Tu biçî cihên dûr jî
Nas û dostên xwe
Heval û hogirên xwe
Ji bîr neke, bi bîr bîne

Cil û lîbasên ku tu li vîtrînan dibînî
Heger tu ji wan hez bikî
Bikire
Ew layiqê te ne

Ji jîyanê hez bike
Ji mirinê netirse
Mey vexwe
Helbest bixwîne

Belê, delala narîn
Tu çi bikî
Ji bo xwe bike
Ku tu şad û bextiyar bibî

Vê ji bîr neke
Heger tu bextiyar nebî
Nikarî evîndarê xwe
Bextiyar bikî…

Tu şad û bextiyar be
Ev bes e.

## BI EVÎNDARA XWE RE

Bi evîdara xwe re
Romantîk bin
Bi hevre pirtûk bixwînin
Bi destên hevûdu bigrin
Bi hevre bigerin

Bi hevre bikenin
Ji hev lome nekin
Bizanibin evîndara we
Ji kîjan gul, reng, muzîkê,
Helbestê û ji kîjan nivîskar
Hez dike

Ji evîndara xwe re
Suprîzan bikin
Qertên pîrozbahiyê
Bişînin

Ji bo evîndara xwe
Helbest binivîsin
Jê re helbest
Bixwînin

Ji bo evîndara xwe
Nasnavên xweş bibînin
Bila nasnav, pê xweş bên

Bi evîndara xwe re
Li ser tiştên tewş
Minaqeşe nekin
Dilê hevûdu nehêlin

Heger we minaqeşe kir
Dawiya minaqeşeyê
Bi ramîsanê
Pêk bînin

Li evîndara/ê xwe
Rexne negrin
Her tim
Pesnê wê bidin

Bi evîndara xwe re
Bibin dost û heval

Bi hevûdu
Bawer bikin

Ji hevûdu
Şik nekin

# EVÎN

Evîn di dilê mirov de carna dibe wek gul û carna dibe wek gule.
Evîna pîroz ruhê mirov şad dike.
Evîn wek zelzelê -erdhejê- laşê mirov dilerizîne.
Evîn mirov kerb dike.
Evîn çavên evîndaran kor dike.
Evîn xezîneyekî ruhî ye.
Evîn nayê qalkirin, tê jiyandin.
Evîn heyecan e, tehma jiyanê ye.
Di evînê de menfeet -berjewendî- tune ye.
Berjewendîyên evîndaran, hestên wan ên ruhî ye.
Evîn tevlîhevbûna hestên ruhî ye.
Tu hêzek, qûwetek, bi hêza evînê nikare.
Însanên ku neevîndarin, bextîyar nîn in.
Dilê bêevîn wek kevirê ye.
Agirê evînê dil û kezeb dişewitîne.
Evîn atmosfereke pîrozîyê ye.
Evîn derûnîyeke patalojîkî ye.
Evîn ji êşa dil û ruh pêk tê.
Ji bo evîndaran derdê evînê, zewqa jîyanê ye.
Felsefa evîndaran fedekarî ye.
Evîn yekbûna du felqên ruhî ye.
Evîn sireke ku kes nikare bipişkife ye.
Yê ku mirov bi jîyanê ve dide girêdan, hezkirin e.
Evîn halê ruhî ê xisûsî ye.

## EVÎNDARÎ

Hezkirin, evîndarî tişteke ciddî ye
Herkes nikare bibe evîndar
Yên ku dibin evîndar
Divê ji evîna xwe re sadiq bin

Xort û keçên ciwan
Ji hevûdu hez dikin
Dibin evîndarê/a hev
Lê, divê bizanibin

Evîndarî tişteke cidî ye

Ji bo evîndar
Bibin xwedî erdem
Hevûdu baş nas bikin
Jê re dem divê

Evîn bi acelê nabe
Evîna ne ji dil
Evîna biharê
Ne evîn e

Dibêjin jin sî saliya xwe de
Mêr çil saliya xwe de

Evînê keşif dikin
Û fêm dikin ku
Evîn hevûdu
Wek heyî qebûl kirin e

Li gorê min
Temenê evînê tune
Ez di çilûpênc saliya xwe de
Bûm evîndarê dilbera esmer

# EVÎNA MIN A EBEDÎ

Min kîngê ji te hez kir?
Ez kîngê bûm aşiqê te?
Min kîngê wan çavên te
Yên reş û belek dît?

Wan çavên te yên xweşik
Hemû xirabiyên dinê
Bi min dane jibîr kirin
Ez heyrana wan çavên te me

Ew çavên te
Weke ku
Ne ji vê dinê bin
Weke çavên horîyan in

Çavên te
Ji stêrkên ezman
Ji bo min
Hatine xwarê

Dema min çavên te dît
Di çavên te de êş xuya dikir
Dilê te sancî dikir
Lêbelê rûyê te bi ken bû

Tu ji bo min rûken bû
Tu keçeka baş bû
Başiya te deng dabû
Ruhê te pêl dabû

Ez aşiqê wan çavên te bûbûm
Ez di tenêtiya xwe de digeviziyam
Ez dizabûm ku evîna min
Nagîşe miradê xwe

Tu hêvîyeke min tunebû
Ku ez bi te re bizewicim
Ji xwe nezewicîm
Tu bi yekî din re zewicî

Ji bo ku evîna min
Bêmirad bû
Ez bi kul û keder bûm
Dilê min şewitî

Roja ku min çavên te dît
Ji wê rojê û pêve
Çavên te
Ji heş û eqilêmin derneket

Wekî ku bi hezarsalan e
Min van çavan dîtiye
Weke ku evîna me
Evîna hezar salan e

Belkî jî
Hezar sal berê
Evîna me
Nîvco mabû

Ev cara duyem e
Ku evîna me
Nîvco dimîne
Naçe serî

Ez hêvîdarim
Dê cara sêyem
Evîna me
Biçe serî

Dîlbera min a esmer
Tu wekî kulîlka biharê
Tu toximê pîroz
Yê welatê min î

Tu bi germiya rojê
Honikiya hîvê
Ava qudretê
Mezin bûyî

Ez ê ji te re
Behsa evînê bikim
Rengê jîyanê û
Hesreta dilan qal bikim

Reşîya çavên te
Şînahîya evînê
Şewata kezebê
Pîroziya evînê ne

Hebûna te
Şadbûna te
Ji bo min
Jîndarî ye

Evîna min
Evîneke
Ebedî ye
Bê dawî ye

## TU BI MIN RE YÎ

Dilopa avê di nav axê de
Çawa wenda dibe
Ez di xeyalên te de
Wenda dibim

Tu canê min î
Tu di dilê min de yî
Ez bêyî xeyalên te
Nikarim bijîm

Bêrî kirin wisa zor e
Bêrîkirina te, hîn zortir e
Jîyan bêyî te
Zor û zehmet e

Wêne gelek xweş in
Wêneya te xweşiktir e
Evîn pîroz in
Evîna ji bo te pîroztir e

Li bêdengîya min nenêre
Nekû min te ji bîr kiriye
Li cîhanê yê ku min bêrîyay kiriye
Ew jî tuyî

Lewre tu, tim di dilê min de yî
Ruhê te di hundirê min de ye
Tu dûr bî jî
Tu bi min re yî

## RONAHÎYA ÇAVÊN TE

Dema dibe şev
Huznek dikeve hundirê min
Rûyê te yê xweşik
Çavên te yên reşik
Tê ber çavên min
Xeyalên te di heşê min de
Ez digrîm ji bo evîna xwe
Tarîtîya şevê
Hêstirên çavên min
Berşê dide

Kes bi êşa dilê min nizane
Bêrîkirina te
Xewn û şevên min
Diherimîne

Çawa ku li ezman
Stêrk dibiriqe
Di hest û ruhê min de
Ronahîya çavên te
Dibiriqe

Tu dûrê min î
Ez birîndar im
Bi birîna dil
Dizarim

Ez li wêneya te dinêrim
Ronahîya çavên te
Tarîtîya şevên min
Ronahî dike

## AŞIQ Û MAŞÛQ

Ez aşiq im, tu mehşûq î
Evîna min ji bo te ye
Dilê min di te de ye
Tu evîndara min a delal î

Hebûna jîyana aşiq
Ji bo evîna maşûq e
Evîna evîndaran
Pîrozî ye

Evîn bê leke ye
Pak e
Tîrêja xwezayî ye
Ronahîya yezdanî ye

# BÊTEBÛN

Der û hundirê min
Heş û eqilê min tuyî
Ez bi bêtebûnê re naçim serî
Bêtebûn zor û zehmet e
Weke valahiyeke bêdawî ye

Bêtebûn, tenêbûna min
Min diêşînê
Ji dilê min
Xwîn dirêjînê

Dema ez çavên xwe vedikim û
Dema ez çavên xwe digrim
Tenê tu li ber çavên min î

Divê ez te
Di şevên xwe yên tenêtiyê de
Hepis bikim

Ji bo bihevrabûna me
Ji bo evîn û jîyana me
Em çi bikin?
Çi pêwîst be em wê bikin

## RASTIYA JIYANÊ

Di hezkirina te de
Bi serketim
Lê, di jibîrkirina te de
Bi serneketim

Evîndarî
Realîteya jîyanê ye
Bê evînê jîyan
Bê jîyan evîn nabe

## EVÎN NEMIR E

Ez li nemiriyê geriyam
Min evînê dît
Di evînê de
Min tevahiya xirabiyan
Ji bîr kir

Cîhana evînê
Cîhaneke din e
Jiyana evîndaran
Jiyaneke din e

Evîndara min
Weke stêrka ezman
Di dilê min de
Dibiriqe

Weke ku evîndara min
Ne ji vê dinê, lêbelê
Ji ezman, ji bo min
Ji bêdawiyê veqete û were

Êşa evînê di dilê min de
Ji ber rûkenîna wê naêşe
Ez di nav tenêtiyê de bum
Hatina wê ji bo min bû hêvî

Roja ku min wêneya wê dît
Ew qet ji heşê min derneket
Weke ku ez û evîndara xwe
Ji sedsalan ve hev nas dikin

Evîna me ya ku sed sal berê nîvco mabû
Niha didomiya, ji nû ve şîn dibû
Di demsala biharê de
Ew carek din bo min bû hêvî

Toximê axa qerecdaxê
Tîrêjên roja Zerdeşt pêxember
Ava çemê Dijlê
Wê ji bo min hilbirandibû

Min şeva din
Evîndara xwe
Di xewa xwe de dît
Min wê hemêz kir

Min çiqas bêriya wê kiribû
Xwîna min pir lê keliya
Dilê min pê şewitiya
Ez ji halê wê re giriyam

Min ji evîndara xwe re
Behsa evîna me ya şîn
Dilê me yê bi evîn
Hêviyên me yê şadîyê kir

Ez û ew
Em birçîyên axaftinê bûn
Me ji hevûdu re
Behsa derdên xwe kir

Em bi dil û can peyivîn
Me dîwarê nav xwe xirab kir
Astengan ji hole rakir
Em rehet bûn, şad bûn

Evîndara min
Nîvê dilê min e
Hebûna jîyana min e
Hêvîya pêşeroja min e

Di jîyana evîndaran de
Hêz û qûweta evîndaran
Evîna wan bi xwe ye
Evîn bêdawiye, nemir e.

## HELBESTA STÊRÊ

Ez di malê de
Bi tenê bûm
Ji ber serma zivistanê
Dileriziyam

Evîndara min a pîroz
Li ezmanan bû
Li min dinêriya
Dilê wê bi halê min şewitiya

Ji ezman Stêr hate xwarê
Ew hate cem min
Ji min re helbest xwend
Helbesta wê ruh û laşê min germ kir

Heşt malikên/beşên helbestê hebû
Helbestê bi van gotinan dest pê dikir :
"Ne bihar sekinî hêviya te
  Ne jî zivistanên xapînok."

Wê bi dengê xwe yê xweş
Helbesta xwe ji min re xwend
Bi qedandina xwendina helbestê re
Xatir ji min xwest û çû ezman

Malîka paşîn ya helbestê
Di gohê min de
Zingênî dikir
Di heşê min de cih digirt

Min Stêra pîroz ya ezman
Di xewna xwe de dît
Wê gote helbest çawabû
Min got pir xweş bû

Dixwazî ez ji te re
Bi ezber
Çarînek ji helbestê
Bibêjim

Çar rêzên dawî yên helbestê weha bû :
”Gelo tuyê cardin bê xewna min?
Hîn li ber şibakê me.
Kulma kuliyên berfê jî li ber biharê ye.
Bihar wekiliyê dike ji bo silavan…”

## EZ JI TE WISAN HEZ DIKIM KU…

Ez ji te wisan hez dikim ku
Ez nizanim bê ez hezkirina xwe
Çawa û bi çi gotinan
Bînim zimên

Dibêjin pêwîstiya evîndaran
Bi helbestan heye
Ez jî vê helbestê
Ji bo xwe û te dinivîsim

Ez ji te hez dikim
Tu hebûna jiyana min
Tu evîna min î
Ez ji te hez dikim

Ji bo ez ji te hez dikim
Bi hezaran sedem hene
Di dilê min de
Evîna te sax daye

Di vê dinya fanî de
Evîna me nemir e
Tu rengê jîyana min î
Tu bayê ruhê min î

Ji xeynê ji te hezkirinê
Tişteke din ji destê min nayê
Di kûrahîya ruhê min de
Evîna te cih girtiye

Bê evîna te
Jiyan li min heram e

Kîngê ez helbesteka evînê binivîsim
Hertim tu di heş û ruhêî min de yî

Kîngê ez bisitirim,
Ji bo te
Kilam û stran dibêjim

Bi hezaran stêrkên nav çavên te
Tarîtiya şevê diçirîne

Dil û ruhê min
Aîdê te ye

Ez dixwazin li nêzîkê
Dilê te bim
Ruhê min û te
Bikeve nav hev

Laşê min û te
Bila bibe yek

Ez bi dil û can
Bi hest û ruh
Ji te
Wisan hez dikim ku…

## NEXWEŞÎYA EVÎNÊ

Ez nexweş ketim
Dixtoran ji nexweşiya min re
Tu çareyeke nedîtin

Nexweşîya min
Nexweşîya evînê bû
Dermanê bijîjkan
Jê re çare nebû

Nexweşîya evînê
Mirov diêşînê
Derûnîya mirov
Dihermîne

Ez ê rebenê evînê
Ez bûme evîndarê
Stêrka dilşêrînê

Dilê min
Ji ber teqîna evînê
Gul veda
Ji bo dîlbera şêrîn

## TU

Evîndara min a xoşevîst
Mamosta min a şêrîn
Gula min a biharê
Kulîlka taca serê min

Tu rindî, xweş î
Tu tîrêja sibê yî
Ronahîya rojê yî
Xeyala şevê yî

Tu weke welatê min
Tu weke bajarê min
Tu weke ruhê min
Di dilê min de yî

Tu xeyalên şevên havînê
Çîrokên şevên zivistanê
Tu nûçegihanê evînê
Tu gula biharê yî

# JÎYAN

Jîyana mirov
Çawa be jî
Jîyan xweş e

Jîyan çîye?
Xwelî û dûman û mij e?
Dûman spî,
Xwelî paqij e?

Jîyan evîn e
Evîn mirov e
Mirov pîroz e

Însan fanî ye
Bi goşt û hestî ye
Bi gîyan û can e
Qurbana wext û demê ye

Evîn tehma jîyanê
Dide evîndaran
Qîmeta jîyanê
Bi evînê fêm dibe

Qîmet bidin jîyan û evînê
Xweşbîn bin, rûken bin
Dilşad û bextîyar bin
Evîn û jîyan pir xweş e

## VÊ BIZANIBE

Heger rojek tu ketî tengasiyê
Tu bixwazî derdûkulên xwe parve bikî
Li min biger, destê min di nav hinguv de be jî,
Ez ê bêm bibim şirîkê derdê te.

Heger tu rojek bigrî, li min biger
Ez ê nikaribim te bikenînim
Lêbelê ez soz û peyman didim
Ku bi te re bigrîm

Heger tu rojek bixwazî birevî
Li min biger
Ez ê nikaribim te bidim seknandin
Lê, ez ê bi te re baz bidim

Heger rojek te xwest xwe ji ser pirê bavêjî
Li min biger
Ez ê xwe bi te re navêjim
Lê, ez ê li xwarê bisekinim û te li hewa bigrim.

Heger rojek tu ketî dudiliyê
Li min biger
Ez ê ji te pirtir te bifikirim
Fikr û raman bidim te.

Heger tu rojek biryar bidî
Êdî gohdariya kesekî nekî
Li min biger
Ez devê xwe venakim

Heger tu rojek bifikirî
Ku te min aciz kiriye, êşandiye
Dîsa jî li min biger
Tuyê bibînî, ez nikarim li te hêrs bibim

Heger tu rojek li min bigerî
Û min nebînî
Soz û peyman bide
Divê tu xwe bigînî min

Lewre ew dem
Pêwîstiya min bi te heye
Ez ji te hez dikim
Vê bizanibe.

## JANA GIRAN

Jana bîst salan
Di dilê min de
Digijgije

Jana zirav
Di ruhê min de
Dipirpite

Jana xidar
Di kezeba min de
Dişewite

## DENGÊ WÊ

Min telefonê wê kir
Min dengê wê bihîst
Çiqas dengî xweş bû
Weke dengê bilbilê bû

Min digot qey
Ez ji çavên wê yên reş hez dikim
Waye ez ji dengî jî hez dikim
Xwezî em li cem hev bana
Û min tim dengî bibîstana

## STÊRA HÎV Û ROJÊ

Hezar sal berê
Ji mirî qerecdaxê mîr Cemal re
Keçek bû
Navî danîn Tovîn

Hezar sal paşî
Ji xalê Cemal ê Qerecdaxê re
Keçek bû
Navî danîn Rojîn

Ew stêrka hîv û rojê bû.

## DIJMINÊ KURDAN

Dijminê kurdan kemalîzm e
Hinek kurd di rêça wî de diçin
Wî diparêzin, pesnî didin
Ev çito kurdayetî ye

Çawa pesnê qatîlê kurdan
Şoven û nîjadperest
Dîktatorekî xwînxwar
Tê dayin
Ev jî ecêba kurdan e

Gotinên Beşîkçî tev rast in
Galegalên xwarzê tirkan şaş in
Arnawidekî rast dibêje
Nîvkurdekî şaş dibêje

## DU DERÎ

Li pêşberê min
Du ode hebûn
Di odeyan de
Du diyarî
Diyariyeke zêr û pere bû
Diyariya din evîn û bawerî
Divê ez di deriyek de
Biketama hundir
Min tenê diyariyeke
Bigirtana
Ji herdu diyariyan
Diyariyeke hilbijartana
Min zêr û pere
Hilnebijart
Min li gor dil û eqilê xwe kir
Min evîn û bawerî
Hilbijart

## DOST

Dostên baş û xirab hene
Dostên xirab du rû ne
Dostên baş yek rû ne
Bê dost nabe
Bi dostan xweş e
Jiyan

## ZEWACA XEYALÎ

Dîlbera min a narîn
Evîna ber dilê min
Evîndara hest û ruhê min
Tuyê bizewicî

Ji bo ku tu dizewicî
Ez ê jî dê bizewicim
Tuyê biroj
Ez ê bişev

Tuyê rastî bi wî re
Bi wî zilamê eletewş re
Ez ê di xeyalên xwe de
Bi te re bizewicim

# EM TÊK NEÇÛNE

Hevoka sed salên dîroka kurdan
”Em têk neçûn, ji paşve vekişiyan
Niha li ser axa xwe, li piyan in”
Ev e rastiya dîroka gel û welatê min

## TARÎFA EVÎN Û RINDÎYÊ

Ji xeynê Yezdanê mezin
Ku li derî hazir û nazir e
Tarîfa her tiştî
Dikare bê kirin

Tarîfa evîn û helbestê nayê kirin

Ji xeynê rebê alemîn û
Pêxemberê ometê
Wêneya hertiştî
Dikare bê çêkirin

Wêneya bextiyarî û rindîyê nayê çêkirin

## MÎRÊ GULAN

Di wêneyê de
Li çavên te dinêrim
Mucîzeyek pêk tê
Çavên te dikenin
Lêvên te vedibin
Tu dipeyivî
Dibêjî
"Mîrê gulan merhaba."

## TU AŞIQÎ

Heger ew tim di heşê te de ye
Tu tim wê difikirî
Tu meraq dikî ku
Ew niha likur e?
Çi dike?
Gelo ew jî
Ji te hez dike, nake?
Wisan e tu aşiqî

## EVÎN NAYÊ JI BÎR KIRIN

Evîndarên ku evîna wan têk çûye
Bi kesên din re bizewicin jî
Heft zarokên wan hebin jî
Sal û demsalên dirêj derbas bibin jî
Ew dîsan ji hevûdu hez dikin
Evîna evîndaran nayê ji bîr kirin
Evîndar evîna xwe ji bîr nakin

Evîndar xweşiya çavên hev
Pîroziya ruhên hev
Coşî û kena rûyên hev
Ji bîr nakin

# MIROVEKÎ ARÎSTOKRAT

Dilê kurê mîrekî arîstokrat
Dikeve keça mîrê qerecdaxê
Miradên wan naçe serî
Evîna wan dibe çîrok
Tu kes bi wan nizane
Tu nivîskar nanivîse
Çîroka wan
Tenê dilperîn dizane
Derd û kulê mire aristokrat

## ŞÎZOFREN

Dibêjin yên şîzofren
Şanoyan diafirînin
Diyalogan pêk tînin
Ez şîzofren nînim
Lewre jî, min qet
Şano neafirandiye
Lêbelê, min li şanoya
Yekî şîzofren mêze kir
Ji tiştek re nedibû,
Şano jî nebû,
Diyalogên dînekî beredayî bû

## CAREK DIN

Hinek însan
Bi renkarnasyonê bawer dikin
Ji wan xeyale ku
Piştî mirov dimire
Ruhê mirov dîsa tê dinê
Bi şikleke din
Di laşeke din de

Ez ji renkarnasyonê
Bawer nakim
Lê, jê hez dikim
Hêviya ku mirov
Carek din dîsa dijî
Dide mirov

Heger ez piştî mirinê
Carek din werim dinê
Ez ê dîsa binivîsim
Heta mirinê

## KÎNGÊ

Halê dinê
Rewşa kurdan
Tevliheviya
Rojhilata navîn
Dê çawa bibe?

Gelên bindest
Di serî de jî kurd
Dê kîngê bigîşin
Azadîya xwe

## DIJMIN

Dijmin pircure ye
Dijmin wext e
Dijmin mirin e
Dijmin bêhntengî ye
Dijmin paşgotinî ye
Dijmin hesûdî ye
Dijmin çil rû ye
Dijmin pirreng e

Dijminên herî dijmin
Xedarîye, kedxwarî ye,
Dakirkerî ye, bê edlayî ye

Dijmin dijberê evîn û azadîyê ye
Dijmin dijê wekhevî û demokrasîyê ye

## HORÎYA CENETÊ

Di zindîtiyê de
Em negîştin miradê xwe
Piştî mirinê
Di baxçeyê Îremê de
Em gihîştin miradê xwe
Ez cenetî bum
Ew jî horîya cenetê

## DÎLBERA QERECDAXÊ

Di welatê rojê de
Ji çiyayê qerecdaxê
Dîlberek derket
Tîrêjên eşqa wê
Kete nav dilê min
Aşqa Dîlberê bi sihr e
Ruhê min bi sihra wê
Hate efsûn kirin

## XEWN Û MIRIN

Mirin tehl e
Xew şêrîn e
Ji bo însanan
Xewn û mirin
Tebiî ne

Xewna ciwanîyê pakî ye
Mirina pîrîyê paqijî ye
Ger xewn û xeyal nebana
Dê halê ciwanan çi bana?
Ger mirina pîrîyê nebana
Dê halê kalepîran çi bana?

## HERÎ XWEŞ

Horî ji ezman hat
Ji min re got :
”Riya evînê bibîne.”

Di vê cîhanê de
Ji evîn û jiyanê xweştir
Tu tiştek tune
Jiyana bi evîn
Herî xweş e

## STRANÊN MIN

Stranên min
Awaza bêdengiyê
Nalîna evînê ne

Stranên min
Dengê azadiyê
Lorîna bengînîyê ne

Stranên min
Narîna hestên
Sirgûniyê ne

## YEZDAN Û KURD

Dema Yezdan (Xwedayê mezin)
bernameya netewan pêk anî
kurdan jibîr kir
kurd nebûn xwedî dewlet
yezdan ji nûve bernameyek çêkir
kurd dê bibin xwedî dewlet

## LO MÎRO

Lo Mîro, mîrê min
Çavên xwe veke
Li halê min binêre

Çima te dîlbera narîn
Neda min

Roja mahşerê
Tuyê çawa bidî
Bersîva ruhê min

Ji ber evîna min
Tuyê nikaribî
Di ser pira sîratê de
Derbas bibî

Tuyê di cehenemê de
Bikşînî cezayê
Êş û birîna min

## ÇAR JIN

Mîrê gula bû
Mêrê çar jinan bû

Çar jinên wî bû
Yek li serendîbê
Yek li stenbolê
Yek li amedê
Yek li wanê bû

Çar demsalên salê
Her demsalek
Li cem yekê bû
Lê, ev nerast bû
Xewn û xeyal bû

## MÎSAK – Ê MILÎCÎ

Her tevgereke
Naveke li xwe kiribû
Hinek proleter devrîmcî
Hinek serxwebûncî

Wan ji yên
Federasyon parêst re
Digotin reformcî

Radîkal û tûjên dohî
Bûn anayasacî vatandaş
Niha diparêzin
Sînorên xwînî

Hemû jî bûne
Mîsak – ê milîcî

## NEXWEŞ KETIYE

Heywax û heywax
Evîndara min nexweş e
Ew çûye ber bahrê
Serma girtiye

Ez ji rojê
Daxwaz dikim
Bila bi tîrêjên xwe
Wê germ bike

Ez ji Xwedê re
Dua dikim
Bila wê
Rehet bike

## HORIYA ESMER

Ez bi cin û periyan re
Bum heval
Me bi hevre
Gohdariya helbesta
Horiya narîn kir
Min digot qey
Horî spî ne
Ev horiyeka
Esmer bû

# RENGÊ KURDAN

Kesk û sor û zer
Rengê kurdan in
Pelê zeytûnê, gul û kevok
Sembola cîhanê ne

Roj roja kurdan
Pîroziya ronahiya cîhanê
Sembola netewa kurd
Di nav ala netewa kurd e
Diçirise, şewq dide.

## KURDINO!

Kurdino, dîrokê ji bîr nekin
Yê ku serîhildanên kurdan têk bir û
Xalid Begê Cibrî, Seyid Riza û Şêx Saîdê nemir eliqand
Sazûmana kemalîst bû

Navê qatîlê kurdan kemalîzm e
Pir eyb û şerm e ku
Kurd bibin kemalîst

Kovara Rizgarî û Riya Azadî
Zanîstê hêja Îsmaîl Beşikçî
Xwînxwariya kemalîzmê raxistin ber çavan
Dijminê doza kurd û Kurdistanê kemalîzm e

Hinek kemalîstên Kurd
Dest pê kirine pesnê kemalîzmê didin

Kurdino, hûn li gotinên van kemalîstan nenêrin
Li dîroka kurdan binêrin
Bi gotinên kemalîstên nû neyên xapandin
Ew rastiyê verşê didin

Kurdino, rastiya dîrokê ji bîr nekin
Li hemberê kemalîzmê xwe sist nekin
Li dijê kemalîzmê, kurdayetiyê biparêzin

## JÎYAN HÊSAN NÎNE

Jîyan hêsan nîne
Lê, jîyan pir xweş e
Û xweş e ku
Mirov li ser yara xwe
Stran bibêje

Di şevên tarî de
Di ronahiya hîvê de
Di kuçe û siqaqan de
Bi yara xwe re gerandin
Hizûr û aramî dide mirov

Belê, jiyan hêsan nîn e
Zehmetiyên jiyan pir in
Lêbelê ji jiyanê xweştir
Tu tiştek nîn e

Jiyan xweş e
Mirin nexweş e
Lê jiyana bê mirin nabe
Mirin carna paqijîye

Weke jiyanê mirin jî hêsan nîn e
Hêsan nîn e ji vê dinê çûyin
Lê koçbarineke mecbûriye
Yên ku bijîn dê bimrin jî

## NAYÊ JIBÎR KIRIN

Hezkirin nayê jibîr kirin
Mirov ji yekê hez bike
Nikare wî / wê ji bîr bike
Min delala dilê xwe jibîr nekir

## ÇI ZANIN?

Hinek dijîn
Nizanin çawa dijîn
Hinek dimrin
Nizanin çima mirin

Yên ku
Jiyan û mirinê
Nizanin
Çi zanin?

## HESÛD

Hesûd
Bi nas û dostên xwe re
Hesûdî dikin
Hesûd
Bi heval, dost û mirovên xwe
Xirabî dikin
Hesûd
Çavnebar û dilreş in
Başiya wan, xirabîye
Ew tenê bi dostên xwe
Bi xwe jî
Xirabî dikin
Hesûd
Neyarên dostên xwe
Dijminên postên xwe ne

## BAŞ Û XIRAB

Xirabî û başî
Gerdûnîye
Di nav gelên cîhanê de
Baş û xirab hene

Xirabê kurdan pir in
Başên wan jî gelek in
Xirab bi xirabiya xwe
Baş bi başiya xwe

Çawa ku cîhan
Bê nêr û mê
Bê jin ê mêr nabe
Bê baş û xiraban jî nabe

## DILŞEWAT

Însan heye
Dilşewat e
Bi rehm e
Ji wan
Xirabî çênabe

Însan heye
Dilkevir e
Bêwijdan e
Dilê wan
Bi kesekî naşewite

Dilê min
Bi zarokan
Kalepîran
Û
Keçên naşîn
Gelek dişewite

## EVÎN Û EZRAÎL

Du tişt nabêjin kîngê tên
Yek evîn e, yek Ezraîl e
Mirov nizane ku
Herdu jî kîngê tên
Hatina yekê xweşiye
Ya di bextreşî ye

## ŞEVÊN SIRGÛNÊ

Ez li dûrê welatê xwe
Li cih û warê sirgûniyê
Bi tenê me, nexweş im, dilerizim
Melayketa rehmê, di şiklê evîndara min de
Tê cem min, dibe şirîkê tenêtiya min
Şevên vî welatê sirgûnê dirêj in, naqedin
Şevên welatê min germin, zû diqedin

## SILAV

Silav welato
Silav welatê ku
Ez lê bum

Biçûkî û ciwaniya min
Li wir derbas bû

Silav welato
Waye ez hatim

Te ciwaniya min dît
Navsaliya min nedît
Tuyê kalepîriya min
Bibînî

## EVÎNA TE

Dîlbera min
Evîna te
Çavên min kor kir
Devê min kilît kir

Esmera min
Evîna te
Dilê min birîn kir
Derdê min kûr kir

Narîna min
Evîna te
Hêviya min pûç kir
Jiyana min serobin kir

Kulîlka min
Evîna te
Xweşiya ruhê min e
Serfîraziya jiyana min e

Delala min
Nehêle
Bila evîna min
Têk neçe

## HUNERMENDEKÎ

Hunermendekî jîr e
Bi keda xwe hunerê pêk tîne
Zilm û zordarî dît
Hepis û zîndan raza
Bê hêvî nebû, bi bawer bû

Hunermendekî zana ye
Siyasetmedarê doza kurd e
Hevalê bîst saliya min e
Bîst sale hevalê min e

## MIN DUA KIR

Min îro bihîst
Dîlbera narîn zewiciye
Ez nîvê şevê
Ji xew şiyar bum

Min ji bo wê
Dua kir ku
Ew jiyaneke
Serfîraz bijî

Evîndar dixwazin
Evîndarên wan
Bi xweşî bijîn
Şad û bextiyar bin

## XÊR Û GUNEH

Di deftera
Xêr û gunehên min de
Xêr pir in, guneh tunin
Lewre jî ez cenetî me

Di deftera
Xêr û gunehên
Evîndara min de
Xêr tune, guneh pirin

Xwezî ew jî
Cenetî bana
Di vê dinê de nebû horiya min
Belkî di wê dinê de bibûna horiya min


Lokman Polat

# Ji Wezareta Çandî ya Swêdê Rapora Pisporê Şêwirmend ê Wêjeyî ya li ser pirtûka Lokman Polat ”Helbestên Sirgûniyê”

Me nivîsê –anku rapora pispor- kurt kir û em pêşkêşê xwendevanên kurd dikin. Weşanên Helwest

### *Nirxandina berhemê*

Berhema Helbestên Sirgûniyê ji şêstûpênc helbestên bi serê xwe ku bi temamî di nava şêstûheft rûpelan de tên rapêçan, pêk tê. Ev berhema nivîskarî ya helbestan ya yekemîn e. Bi texmînî ji sisîya yek ji helbestên berhemê di derbarê jiyana sirgûnê de ne, di derbarê ji dûrbûn û bêrîya welêt û ya dewr û bera malê de ye. Ji deh helbestan bêtir di derbarê evînê de ne, lê yên mayîn jî  di derbarê çarenûsa gelê kurd ya ne bextîyar de ne, tasawûrên di derbarê sîyasetê de û nexasim bîr û bawerîyên li ser nivîskarîyê û peywendîyên di navbera mirovan de.

Gelek ji helbestan ji bêhuzurtî û bi tenîtîyê tên neqişandin. Xislata sereke ku ji serê berhemê heta binê wê tê xuya kirin ew e ku dîsa bi jiyana xwe ya berê re ( ya xortanîyê re)  bibe yek, ya ku ji alîyê sirgûnê ku ne dihate xwestin, hatibû birîn.

***Bedewîya berhemê ya zimên û wêjeyî***

Berhem bi kurdîyeke ku mirov bi hêsanî têdighe hatîye nivîsandin.
Gelek helbestvan û nivîskarên kurd yên piçekî jêhatî xwedîyê stîleke kesî yeke ber bi çav in, ku pirrê caran li ser bingehê rîtm û melodîya zaravayê xwe yê navçeyî dideynin. Lê, ligel ku nivîskarê Helbestên Sirgûnîyê Lokman Polat ji coxrafîyeke Kurdistanê ku xwedîyê zaravayekî bêemsal e jî, wî hewldaye ku bi kurdîyeke dîyar î  standart binivîsîne.

Herçiqas çend cotên helbestên bedew di berhemê de hebîn jî, lê belê gelek ji wan yên mayîn dişibihine wan helbestên xwendevanan yên  ku di salên 1980 î de di nav rûpelên organên rêxistinên politîk de dihatin veşandin. Nivîskar pirrê caran xwedîyê helwesteke bavane / mamoyî  ye ku şîretên giranbiha di derbarê jîyan û tekilîyên di navbera mirovan de dike. Ligel ku gelek ji helbestan behsa mirovan  û têkilîyên wî bi dorbera wî re dikin, ne xwedîyê wan xisletên kesî ye ku bi ya min bedewîya helbestan ji yên hêsa / normal bilindtir dike.

Bi serva temamkirina pêşgotinên peywendîdar ( li ser daxwaza …C )

Di pêşgotina xwe de nivîskar Lokman Polat dinivîsîne ku wî çirok, novelên kurt û roman nivîsîne. Lê wî di serpêhatina bîst salên dawîn de gelek helbest li ser hev kom kirine ku dema ilham pê re peyde dibû, dinivîsandin. Wi ev helbest di dido berhemên ji hev cuda de weşandin.

Hêmin Kurdaxî ( nivîskarekî xwedîyê berhemeke helbestan e ) ku wî yek ji wan pêşgotinan nivîsandîye, vedibêje ku helbest bêrîya mirovekî ku gelekî bêrîya welêt û evîna ji destçûyî kiribe, raber dikin. Kurdaxî dibêje ku ew nivîskarî mîna nivîskarekî bi nav û deng yê novel û romanan nas dike, ku niha bi alîkarîya vê berhema helbestan hîs û bêjnên xwe raber dike ku mirov xerîb be, his dike bê xerîbî çawa ye.

Azer Osî ( helbestvan) li ser pirtûka Lokman Polat dinivîsîne ku nivîskar di vegotina xwe de ya ku mirov dihêle his bike bê mirovekî bîyanî li sirgûnê çi êşê dikişîne, biserketî ye. Herweha nivîskarî bi awayekî bi serketî dikarîbû hîs û pêjnên xweyî hêvîyê, evînê û bêrîya ku dîsa vegerê welêt, vebêje. Azer Osî di wê bawerîyê de ye ku zimanê nivîskarî yê helbestvanîyê jî xwedî mistewayekî navnetewî ye.

Ji Swêdî wergêr: N. Zaxuranî

Stokholm - 07/ 07/ 2004